

HUSSÊN HEBEŞ

LI WIR

LÊVÊN KEVIRAN

ÇÎK DIDIN

HELBEST



Institut kurde de Paris

K.L. 2797

[Faint handwritten notes]

LI WIR

Hussên

LÊVÊN KEVIRAN

ÇÎK DIDIN

*13.5.94
Bonn*

HELBEST

Institut kurde de Paris



HUSSÊN HEBEŞ

Institut kurde de Paris

LIV. KL. 2794
10/07/2018
922 HEB LIW

Bo pirtukxana
Institutê Kurdî
ê Parisê

LI WIR

LÊVÊN KEVIRAN

ÇÎK DIDIN

Bonn 13.5.94

Rêzkirina êlêktronî,
derxistina hunerî û
nivisîn : H.H.

Tablû : Îsismet Abdul
Qadir

Çapa yekê 1994

Mafê çapê bo nivîsevan
hatiye parastin.

* * *

BELÂGEHA HOGIR

Bonn 1994

Institut kurde de Paris

Bo şehîdên welêt:

Mûsa enter,
Dr. Şeref Qendî,
Fetah Ebdulî û
Humayon erdelan
pêşkeş e.

ŞEHİD PIRR IN

em nîkarin
her şehideki dî gorreke tenyayi
de veşêrin,
Erd biçûk e,
Têra cendekên şehidên
kurdan nake !!



شەھید پیر

نەوا نەزان
شەھیدەکی دگۆزە کە تەمای
دا ئە قەتێن
نەرد بچوو کە
تێرا شەھیدین
سکوردان ناکە !!

17/11/2011

93

ŞEHÎDAN JIBÎR MEKIN

Hemû nimêj
pûç in,
Eger navên
şehîdên Helebce li gel
navên pêximberan netên
xwendin.

شەهیدان
جیبیر مەکین

هەموو نێمێج
پوچەن
نەگە - ئافەن
شەهیدان حەلەبە بێجە لگەل
ئافەن پێخیمە ران نە تێن
خواندن .

EWÊ ROJEKÊ KUŞTÎ VEGERRIN

*Berî hezar salî bêtir
bî ser axa me de hatin,
Şûr bî xwe re
anîn, gorristan, gorristan
ava kirin, ava dîkin.*

*Jî biyabanên dûr hatin
kuştin anîn,
Bî wê
landika mirovatîyê
wêran kirin,
Wêran dîkin .*

ٲهوی ٲوزہ کی کوششی ٲہ گہ ٲن


ٲہری ٲوزہ سالے ٲنیر
ٲ سہر ٲافامہ دا ٲاٲن ،
شور ٲ خور ٲا
ٲانین ، گور ٲستان ، گور ٲستان
ٲاٲا کرن ، ٲاٲا کرن .

ٲر ٲیا ٲانین دور ٲان
کوششی ٲانین ، ٲ ٲ وی /
لانڈکا مرو ٲانینی
ٲیران کرن ،
ٲیران کرن .

*Pîreke kurd, piştkevanî,
Ço bi dest de,
Pendyara dîrokî kevnar
dî nav qermiçên rûyê wê
de hişk bû bû,
Vedîpekî
lî kurt û kevirkuçika,
Lî gundekî xulmaşbûyi
dî hemêzê çayî Bilêlî lêzmf de,
Rokê guhê min tengijand:
Kî Kuştîyar tê,
Rojekê ji rojan kuştî
vedigerre.*

Institut kurde de Paris

پیرہ کہ کورد، پشتکہ فانی،
چو ب رہ ست دا
بہ ندیا را دیروئی کہ کنار
دناقی قہ رجین پرویی وی
دا هسندک بو بوو، / قہ دیہ کی /
ل کورت و کہ فر کو چکا،
ل گوندہ کی فولاسنبووی
دصہ منزی ہانی بلیل تی لیزم دا،
پوکی گوھر من تہ نگراند :
کی کوشنیا رخ،
پو آہ کی تر پووان کوشی
قہ دگہ پہ .



شەوا مەزین
ئەز بێ جاران
بە مەروفا سێ قە
قەدی دێم
گامی ئەز دێم
تێنە کۆشتن
و بێهان بە قەساری
وان سێر دێم

ŞERMA MEZİN

Ez bîr caran
ji ber mirovatîyê ve
fedî dikim,
Cavê ez dibinim zindî
têne kuştin
û cihan bi xemari li
wan sêr dike.

DENG

Bo Hussên
û xwarziyan giştan

Dengek

Ji wî alî,
Nazik, genc, hizan û sad e
dîhat,
li rêçên xweyîtî, koçbûyî dipirsî.

Deng e -

Şahîxewn e,
Lî hêlinên kevînar û nû.

Cejn e -

Lî sersal û
li binsalan.

Deng e -

Lerevîn e,
li hebûn û tînebûnê;

Dengo!

We dengî be.



پۆ خوستنا
و خوارزان گهستان

دهنگ

زوی ئالی،

نازیک، گهنج، هزان و ساده / دهست،

ل پێچین خواییتی، کوچهپوری درسی.

دهنگه

سهامی خهونه / ل قهینهین که خهوار و شوو.

جه زنه

ل سه سهال و / ل بنسالان.

دهنگه

له ره قینه، ل سه بهون و نه بهونی؛

دهنگه

وه دهنگین به.

BI HIDAVA TÎRÊJAN DE

*Bi pertava
royê
dîmê xwe şuşt,
Bi axa afirrandinê,
Bi tiberkê
xwe xemiland..*

*Bedewtirîn
candarê vê serdemê ye,
Ava kaniyên pîrozî
ji kaniya gewriyê dihat,
Çavên dêrîniyê mistan,
Ronahiya
peristgehên kevnar anî,
Nestîle bû,
Bextewar bû.*

به هندوفا
شیرین دا

به زنافا
پرونی

دعای خواشوست،
به ناخا ناخراندن،
به تبه رکت،
خواخه ملاند.

به ده ورن
جاندارن می سرده می به،
نافا کاشین پیروزی
ز کاشیا گه ورن دهان،
حاجتن درینیبی مستان،
روناهیسا
به سنگه هین که قنار نانی
نه سستله بوو،
به ضنه وار بوو.

GÊLAS

Gîyan!

Tenê niha ez tégêştîm,

Çîma berê

helbest temam

ne dibûn, dîhatin kuştin,

Çînkê min nîzani bû ku

tu huner bû,

Tu dayîka hunrrawan bû,

Tu jîyan bû.

2

Gîyan!

Odêssa yekem bender bû

telqîn dixwend bi horrîna

gemyê,

Bi livîna Şestekoviç 1),

Dema dirêj

min nijand dî gorristanê

dîlî xwe de.

**Em man dî nav sinoran de,
Dûr, dûr,
Li welatan , kontênêtan.**

3

**Gîyan! e
Li her drana we dibîhnim:
Li bajarên,
Di basan de,
Di nav şepolên deryan de,
Di xewnan de.
We dibîhnim,
Lê lal dibim,
Ez nikarim
dî paş perdê durbûnê de
bi we re deng kim, bilizim.**

4

**Gîyan!
Sunîşt li vir rast biheşt e,**

**" Lê ji meriyî yara xwe
ne di gund de, mîman qaska
qîtranê ar di bin de" 2).
Royê vir sar e, bapeşkê
bi ser min de dibarîne,
dîguvîne.**

5

**Ji mirovî nivî temenî xwe
di nav pirtûkan de derbas kirî,
Gelek pê zehmet e berhemên mesenî bibîne,
Lê gavê xendên te li ser lêvên
te hildîpekin
û wek pêpilûskan li ser gulê
maraqên min dilîzin, dinîşin,
Ez dibûrînim
dîzekên hunerî û zanistî.**

6

Gîyan!

**Dara zanîné agir e,
Mîrov dîke rejî, arî
Gavê nizanibe xwe li ber germ bike,
Hîn pîrr caran
bona bêtarên jîyanê
me ne dîn ber lehiyên xwe,
Gerek e em hêlinên xwe
li ser pîkan ava bikin.**

7

**Gîyan!
Kelên bîraninan di ser hev werdibin,
Bi agirî nedîtîné dipêpitim
Mîla girîna Vîyanê bilind rabe,
Ew ji min re awazeke çiyayî ye,
Mîla li ber kelyaskê 3) rabim şevîné,
Bêzar nabim;
Ezê jê re bineninim
çî zanîm jî stranan,
Ji çîrok û jî mejveman.**

**Mila kêmxew bim, bêdar nabim
şev û rojan,
Çinkê şad im, bextewar im,
Bes bi we re.**

8

Ez bijangê demê dipêr,
Ger çi sanyê bihênije,
Ezê gemiyê gerdûnî
zîn kim û bixemilînim,
Bi lezîni
ezê
xweb we gîhnim.


9

Lî mîrîşînê qundîsê
hebûn û nebûn wek hev e,
Hevdudîtin bê fêde ye;
Lê gavê tu
bersîvan jî pîrsên Hogir re nabîni

**Û nîza dîkî bî girî;
Hêstîrên te fener In, rê
II pişê min rewşen dîkn.**


1. Şestekoviç navê gemiyê ye.
2. Ji strana Zêno ye.
3. peyveke rûsî ye; ereba zaroka ye.

Institut kurde de Paris



KURDISTAN

*Kurdistan -
İmpêrya sermeketînê ye,
Kurdistan -
İmpêrya qehremaniyê ye,
Kurdistan -
İmpêrya İberxwedanê ye.*



VÎ PESARÎ

*Pesaro! Ne hatibûm pirsan keji kim
li navê te,
Ne hatibûm
bejnê te bi kunê derzyê
ez bipîvim,
Ne bazirganan, çinokan
rêz kim li xanê mirovan.*

*Va werza beyar bû, pûç bû,
Gîsin şikya
li nav zangan,
Li nav rişan,
Li aşî serneketinê
barê zîwanê min hêrî,
Arvan anî,
Li gewerê birçitîyê
sêla dîlekan min ar kir,*

فی یہ ساری

یہ سارو! نہ ہا بیوم پرسان کہڑی کم
ل نائی تہ ،

نہ ہا بیوم اب کوخہ دہ زری
پہ زرف تہ ،
نہ بازار گانان ، ہنوتان
پڑ کم ل خانہ مرقان .

قا وہ زرا بہ یار بوو ، ہووہج بوو ،
گیسن سلسا
ل نائف زانگات ،
ل نائف ریشان ،
ل ناشی سہ زہ کہ تہی
باری زبوانی من صہری ،
نارخان نائف ،
ل گہوہ ریج برہیتینی
ستیلہ ذیلہ کات من نار کر ،

**Aram bijart
Jema min bû,
Her dem dîxwer .**

**Pesaro! Bersîv şêlû bûn,
dîxulxulîn ji cobaran,
Şîndokîyê şivîlan bûm,
Qijavîyan hemêz kirim,
Pejna leyîlanê xapandim
Li ber şemikê şîketan
dergevan bûm,
Tarî dipa,
Li ber gola
genî min lêksî dixwendin
ji masyan re,
Li şevnişînan min meya
tal dimîji,
Sermest dibûm
bi şîrînbêjên derewîn,
Dikuzim ji êş û Janan.**

ئایام بزارت
ئەمان بوو ،
هەر دەم دخواز .

بە سارو ! بە رستە شیلوو بوون ،
دخواز خوێنێ ئاز جۆباران ،
شێند و کێش شێلان بووم ،
قراخیان هە منز کرم ،
بە ئانا لە لایانم ،
ئ بەر شێکی شێه تان
دە رگە فانی بووم ،
تاری دیا ،

ئ بەر گۆلا گۆلا
گەش من ئیکسی خوێدن
ئ ماسیان را ،
ئ شەقنشینان من مەیا
تاک دمری ،

سە مەست دبووم
ب شیرینیژین دەره وین ،
دکوزیم ئ ئیش و ئانان .



**Pesaro! Ez natîrsim ji
gef û gurran,
Ji rojên girj;
Tova gul û gulşena me,
Weşa biharê diçinim
di govdê asoyî sor de,
Rimj im li esmanî zaman,
Ewran derzî
dîkim bi zîpkên baranê,
Dêmon im ... li reşantîyê
dîlî xwe vêdixim, rêyê
nişan dîdim,
Ji bendyan re,
Hejaran re.**

Institut kurde de Paris

به ساروا بهز نارسم
 که ف و گوران
 از زمین گرد؛
 توفا گول و گولشه نامه،
 وه شا بهاری زمین
 رگوفدی ناسون سورد،
 مرم له نه سمان زمان،
 نه ورن ده زری
 دکم ب زین باران،
 دمنوم ... له به شانتی
 دلی خوا فنهم،
 نیشان ددم
 به ندیان
 صه اران

**ZARROYÊN ME
DIKUJIN**

*Zarroyên me
ji serma re,
Ji nêza re,
Zarroyên me
bi guleyan,
Bi gazan û
bi hemû terzên naskirî,
Û nenaskirî tên kuştin.
Lê di vê gênosîda di
dawya sedsala bîstan de
- û yê bihurî ne kêmbûn -
Zarroyên me
çav vekirî
dimirin, ew
li vê cîhanê dinirrin.*

زایوتین مه
دلورتن

زایوتین مه / ارسه ما یا /
انیزا / زایوتین مه /
ب گولمان / ب گازان و /
ب هه موو ته زین ناکری /
و نه ناکری تین کوشتن /
لی د من گیتوسید /
داویا سه د سالد بیستان دا /
- و تین ۷۷ وری نه تین بودن -
زایوتین مه / جاف مه کری /
د من ، نه و /
له من بیجانی دیرنه !

DILÎ XWE BI TÊL KE Û ŞAHÎYÊ BELAV KE

*Bîhna sîman a sasi
meyî bû li ser bêderan,
Bi awat bûm
tenbûra Şêxoyê qerec
ez guhdar kîm.*

*Kodik dîda dest lawê xwe,
Jê re digot:
" Çend meqaman
ji pismamê xwe re lêxe.. "*

*Ringûpingî ji nav tilyên
Êxres
derdiketin,
Lî nav tokê rewîna sêg
siwar dibûn.*

دلی خوا ب تیل که
و شاهیی به لاق که

بهنای سیرمان ناساسی
موی بود ل سه پیده ان ،
ب ثاوت بودم
ته نبود را شتخونی ته ره ج
ته ز گوهر لم .

کوزک در ده ست لاری خوا ،
ری ا دکوت ؛
دجه ند مه قامان
ر بسامی خوا ا لته ..

رینگوینگی ر ناف لیلین
ببخره سیر
ده ر دکه تن ،
ل ناف توئی ره وینا سیک
سوار دبوون .

**Şêxo, destbrayê bavo bû,
Ew bê tenbûr dihat mal ê.
Şêxo sond xweribû têtên
tenbûrê jî xewê rake
û wek caran
dilan geş ke ..**

**Derdo!
Ma dibê mera dest jî jîyanê berde
û hin mera
sax be.**

Institut Kurde de Paris

شیخو، دستیرای باقو بوو،
نه وین ته نبوو دهات مال ی.
شیخو سوند خوار بوو تیلین
ته نبورک ژغه وین آله
ووکن جارت
دلان کهن که ..

دهردو! ما دین مه دهست ژریبان بهرده
و صین مه
ساغ به .

EWÊN RAKETINE

**Raketine,
Bî zomzomî,
Bî tenyayî.
Raketine,
Bî hevdu re,
Ji hevcuda.
Raketine,
Rût û tazî,
Bê dest û ling,
Li her derê
Raketine,
Li nav zinar û geliyan,
Li nav çirav û lêlavan,
Li nav bapeşk û barovan.
Raketine,
Li ser bistî û kendalan,
Li ser bomban,
Li ser rê û**

تہ و تین پر الہ تہ

پر الہ تہ ،
ب زخم زخمی ،
ب تہ نیایی .
پر الہ تہ ،
ب صفت دو ،
ز صفت خود ،
پر الہ تہ ،
پر و تازی ،
ب دست و لنگ ،
ل ہور دہری .
پر الہ تہ ،
ل ناف زنا و گہ لبان ،
ل ناف جراثی و لہ لاقان ،
ل ناف باہ شک و با پرفان .
پر الہ تہ ،
ل سہ - بست و کہ نزلت ،
ل سہ - بزمیات ،
ل سہ - پری و

rêkorkên bajar û gundan.

Raketine,

Di bin sîvekên xaniyên

çoçkirî de,

Di bin guliyên berfê de,

Di bin esmanê tîrsê de.

Raketine,

Li ber deryên peristgehên

zerdeştîyan,

Li nav senger û şiketan,

Li nav mîzgeft û kilîsan.

Raketine,

Li her derê,

Li kuderê

dikeve û nakeve bir

û xeyalan .. kurdên me û

aşoriyên hevwelatî

Raketine,

Û bi ser de

di nav xişm û bêtarê de

qundaqên serbazên tîrkan

serê jin û pîr û kalên

پریوژین بازار و گوندان / االه سنه /
دین سیله کین خانیق / کوچگری دا /
دین گولین به رخ دا /
دین له ساقی ترس دا .

پاله سنه ،
له به ده رین به سگله هین
زه ده شنیان ،
له نای سه گله و شله مان ،
له نای مزگه قه و کلیسان .

پاله سنه ،
له هه - ده ری ، / له کوده ری /
دکه قه و ناکه قه بیر
و قه یالان .. کوردین مه و
ناشورین هه قه وه لاکه

پاله سنه ،
و به سه - دا
د نای خشم و بیاران دا
قو نراقین سه - بازین ترکان
سه ری ترن و پیر و کالین

me dişkînin,
Û kînên xwe
bî ser me de dirrijînin.
Raketîne,
Bagerr bûyîna zarrokan
pîroz dike,
Her bi wê ritwalê jî
binax dike.
Raketîne,
Şîr - seqem e.
Birçîtî - dêwekî xedar û sawir e,
Bî nav qelfên revyan ketî
wan dihêrre.
Hêvî - ew e,
Eger mirîn bilezîne.
Û serketin -
eger çiqas dereng bê jî,
Ê rojekê
lî me lwis bê,
Eger
Qurbanîyên raketîyan,
Birîndaran, birçivanan,

مه دشکینن ،
دکینین خوا
بسه ره دارترین .
آله شه ،
باگه پر بودینا زارپوتان
پیرتر دکه ،
صه - ب دی بیتوانی نری
بن تاق دکه .
آله شه ،

شیر - سه قه مه .
برهیتی - دیزه کی خه در دساوره .
ب تاق قه لفتن بره قیان کهنی
وان دصیره .

ضنی - نهوه ،
نه گه مرز بله زینه .
و سه که تن -
نه گه - حقاس دهره نگی بی نری ،
نی برتزه کی
له مه لوپس بی

نه گه بر
فورایینن آله سیان ،
برشیدارتان ، برصیفانان ،

Ù şehidan
|| bajarrên
Bexdayê, Anqerê, Şamê û Tehranê
netên firotan.

و شه هیدان
ل باژارین
به غدایی نه لقه تی سانی -
و به هراقی -
نه بین فروتان .



دروا الفوتاه

1995

HEYÎNA TAL

Em di bin sîyên fermanên
kuştinê de
peyda dibin,
Loma heyîna me tal e.

هه‌یینه‌ی تال
ئهم دین سێین فله‌مان
کوشتنێ د
په‌ی دین
لوما هه‌یینه‌ی تال

OZON BIRÎNDAR E

*Struhên gê dirîzin,
Erd diçelqe,
Zêt dibare,
Berf reş têxwer,
Erzayîlê Mêrîkulê
xedar bûye.*

*Hîn baranên sor ê lêkin,
Çîmenên reş ê şîn bibin,
Cendekên kuştîyan ê jî
yên zindîyan bêtir bibin,
Wê çaxê rê
jî bizeyên siyasîyan re namînin.*

*Temenê heyîne li pêş
çavên me, li ber destên me
wêran dibe
û em hemî lê sêr dikin.*

ٹوزون برنڈارہ

سروہین گئی درزن ،
ٹہرد دہ لہ ،
زیلے دبارہ ،
بہ رخ رہش تی خوار ،
ٹہرزانی میتری کوئی
خدا بوویہ .

ہین بارانین سو ری لیکن ،
ہمہ نین رہش تی شین بین ،
مہ نڈہ کین گوشیان تی ،
نین زندیان پیر بین ،
وی جاغی ری
بزہ شین سیاسیان پانامین .

تہہ ناہہ بین ل نیش
جاغین مہ ، ل بہ رہ ستین مہ
وٹران رہہ
وٹہم مہ می تی ستر دکن .

VÊ NEWROZÊ !!

*Dilê hawîdorê bi me
dişewitî,
Me li çavên hev dinirî,
Benên danganî diçirîn,
Em di xwe de dikuf kufin,
Tenê: " Cejna we pîroz be"
Bi dijwarî
ji nav lêvên
me derdiket
Û her ew bû,
Me her kesî
di ber xwe de
nimêjên xwe
bona bêtirî pênc hezar
kurdên şehîd û birîndar
dikir.*

فخ نه وروزی !!

دلی هاو پروری به مه
د شه وفت ،
مه له مافین هه ف دزی ،
به نین ده نگانی د مریت ،
نهم د خوارا دکوف کوختین ،
ته ف : « جه رنا وه پرور به »
به دروایت

زناف لختین
مه ده درکته ت
وهه - نه و بود ،
مه هه - که سی
ر به - خوارا
غیرتین خوا
بوئا تیرت پینج هه -
کور دین شه هید و برنیدر
درکر .

DE MILA CAREKÊ JÎ WE BA

**Mila li ber
hewşê her malekê du derî hebana:
Yek biheştî,
Yek dujehî,
Mila
ew jî xweserê vebana,
Lî gor rindî
û nerrindiyên mirovan,
Hele te yê bûstek vala
dî dujehê de bidîta !!**

**Mila li şûnê kuştinê,
Birçitîyê,
Me mirovan,
Me xwe rast mirov bidîta !!**

JI KIRÎSTYANÊ RE

- hozanvaneke elman e -

**Ne laf û sozên sîyasîyan,
Berî hîlbijartinan
min sergerdan dîkin,
Ne seyran û geştên wan
min sosret dîkin,
Na .. Na ..
Behredariya vehandinê,
Meznahiya dil û evinê,
Mirovhezîya Kirîstyanê
dî vê serdemê têknîkî
tepel de,
Min şa dîkin.**

Institut kurde de Paris

JI GOTINÊN JINEKE KURDE PENABER:

*Ta Seddam heye
em venagerrin,
Ew me dikuje,
Çavên zarroyên me derdixîne,
Memkên keçên me ,
Çîçkên jinên me
dibirre ..*

*Em venagerrin,
Çiqas zarro li şûna me mabûn
û kalepîr tev,
Serê wan jêkirin, kuştin ..*

*Ta Seddam heye
em venagerrin,
Mila em li nav
çîyan bimirin ..*

ز کوشن زنه که
ز گورده به نابه /

تا صبه دایم هه به
ئه م فه ناگه رن ،
ئه و مه ز کوزه ،
ما نین زاروین مه (ه ردینه ،
مه مکن که مین مه ،
چیکین زین مه
دیره

ئه م فه ناگه رن ،
ه قاس زارون شوونا مه مابودن
و کاله بر ته فت ،
سه ری وان زینکرن ، کوشن

تا صبه دایم هه به
ئه م فه ناگه رن ،
مال ئه م ل نان
بیان بمرت ..

EV PÊRRYANA JI DÛR VE TÊN

*Ji jor ve tê
Angêlîka 1),
Ber welatê me difirre,
Ew sînoran diçirrine,
Li hêlîna Kardoxîyan vedinişe,
Li deşt û çiyayên janan
rastîya mejvema jînê
li ser rûyên me dixwîne,
Ayatên germasiyê liezber dike,
Bedewîya surîştê di
dilê xwe de dilûsîne.
Angêlîka
guhê dîroka derewên
stemkaran peht badide,
findeke geş
di vê demê tarî û reş de
vêdixîne.*

نہف پیریا نا
ر دورقا تین

ر دورقا تین
نہ تکلیکا

بہر وہ لاطخہ مہ دفہ ،
نہ و ستوران دہرینہ ،
ل ہیلینا کار دوخیان فہ دیشہ ،
ل دہشت و ہیاتین زانان
راسییا مہ رقیہ ما تریخ
ل سہر رووی مہ دغونہ ،
نایاتین گہ تاسیین نہ زبہ ر دکہ ،
بہرہ و با سورشتین د
ذخ خوادا دلوو سینہ .

نہ تکلیکا

گوہن درو کا دہرہ وین
ستہ مکاتین بہ ہت باددہ ،
فندہ کہ گہ ش
دخ دہمن تاری و پڑش دا
قید ضینہ .

Hêla 2)

**kenê kurdan begem dike,
Şiket û mêrgan dînase,
Erda birîndar dipîve,
Bona serbestîya kurdan
dî zîndana Saray Qapî de dimîne,
Jinên kurd li wir dibîne,
Ew bi hev re
Kuxînan di xwe wer didin,
Lî ser menqelên mikrobên
xew dikirin,
Êş û kulan dijemînin,
Biskên xwe bi şeyên xwîni
şe dikirin.**

1. Angêlika Beer jineke elman e,
hilbijartîya gel bû di perde-
mana elmanî de. Ew bi dilger-
mî pişgirîya têkoşîna gelê
kurd dike.
2. Hêla Şûmbêrger rojnamevaneke
elman e, du berhemên xwe li
ser kurdan nivîsîne. Bona aza-
diya kurdan ketîye zindanê.

هټلا
 کهڅی کورډان به گم دکه ،
 شله ت و نرمان دناسه ،
 نه ردا برنډار د بڼه ،
 بوئاسه ربه سټا کورډان
 د نښاننا سه راتی قای دادینه ،
 نښت کورډان له وور د بڼه ،
 نه و په صه ف را
 کومینان د خوا وور دت ،
 له سه ره ته لټن میکرویان
 نه و د کرن ،
 نښت و کولان د څه مین ،
 بسکین خوا به شه ښن خوښی
 شه د کرن .

BÊJE ...

Bêje, rastyê şêlû meke,
Bêdengi damarên jîné dirrizine,
Eger serî te jî tol be,
bêje ...
Her rastbêjek
kamoyek e,
Bêdengya te
serketîna kuştinê ye.

بێژە ...
بێژە ، راستی شێلۆ مەکه ،
بێدەنگی دامارێن جینێ درزینە ،
هەگە - سەری تە ئێری تۆلە ،
بێژە ...
هە - سەری تە کوشتنێ بە
کاموێیە ،
بێدەنگی تە کوشتنێ بە .

TU ..

**- Ji qelemhligirtiyên
xwefiroş re -**

**Te xwest, veke
yan bigire
tu, wan guhan,
Siwaqke wan
bi derewan,
Bi çimentê,
Gunehbar î
tu, tu
Il heretê gênosidê
kes bi şayî helnapere
ger ne tu bî.**

Institut Kurde de Paris

HARBÛNE ...

**Hoyeswerda -
Ji hilweşandînekê
ber yekê dehrre;
Hoyeswerda -
ala kuştinê rakirî,
Biyaniyan
bî şîşên kînan dîbrêje,
Hoyeswerda -
xwe rût dike
Ji bayexan.**

Institut kurde de Paris

**LI SER RÊÇÊN
KEVIN**

**Rostock -
Rêçajo ye,
Xwel badîke,
Tê hawarê,
Bi kêf
diçepkîne û dimîne.**

**Rostock -
Kûrbirînên
xwe bi xwayê
dikewîne ..**

Institut kurde de Paris

RÊKORD

Ji berbanga dîrokê de
em şerr dîkîn,
Ji du hezar salan bêtir
em bo azadîyê xwinê
dirrijînin
Û ta niha
hîn em dî destpêkê de ne.

رێكورد

ژ به بانگا دێرۆن دا
ئهم شهڕ دکت،
دوهزار سالان بێتر
ئهم بو ئازادیی فوونیی
دێرین
و تاها
هین ئهم دده سێتیارانه.

إن العرب
يتصرون
في الزائم

*Diroka Erebigana nujen
her serketin in,
Ereb tenê di
binketinan de
bi ser dikevin.*

دیرۆکا ئەره بستانا نووڕەن
هه - سه - نه ئه ئه ،
ئه ره ته فه د
بئه تان دا
ب سه - دکه ئه .

KES NIKARE ..


*Eger çiqas
ewrên kîmyayî, Jehrayî
li asmanê heyînê me
mexel bikin,
Û kuştinê
bi nûçekan,
Bi qelfên Mig û Miracan
û Fantoman
bi ser me de bibarînin,
Em mehf nabin,
Kes nikare
rehên me hilke, bibîrre,
Ew kûr çûne,
Tevî rehên erdê bûne,
Ew bi hev re
Şahî û evînê li dinyê geş dîkn.*

کهس نگاره

نه گه ر قهاس
 نه ورتن کیمیا، ره هرا
 له نه سافه هه سین مه
 مه هه له سین،
 و کوشتن
 به نوره کانه،
 به قه لفتن هیک و میراجان
 و فانتومان
 به سه - مه را بیارین،
 نه م هه هه نابن،
 کهس نگاره
 ره ههتن مه ههله، بیره،
 نه و کور ههونه،
 ته فی ره ههتن نه رن بوونه،
 نه و به هه فی را
 شاهن و نه فینن له دینی گهش دکن.

HOGIR BÛ

*Ku tu hatî
reş û tarî
sipî vebûn,
Berfa çiryayî çira bû,
Jî eşqan re
min Bengladêş,
Ênglîstan,
Kolûmbiya
hişyar kirin
û bi hev re
me tosta bûyinê rakir
Ger jî dest min derketiba,
Dî wê finca gerdûnî de
min ê cîhan
vexwendî odehêlîna
xwe bikira.*



Institut Kurde de Paris

10

12

APO! EM HATIN

(*Li ber tîrba Qanatê Kurdo
li Leningradê*)

Zerê - profêSORA zimanê kurdî,
Şagirta Kurdo a pêşî
gul av didan
û digazand:
" Ji zû da kes nehata vir,
Ser li mamoste nedayî,
Kulîk çelmisîne, serî xwer kirine. "

Êhmo - xîmîzanê lawîn,
Di vê leboretorya gorristanî de
axşwîv dikir.

Heydo - hozanvanê rewal,
Îro li vê " Mîvanxanê " rawestya bû,

Institut kurde de Paris




Prof. JANATÉ
Kurdo

**Keser dikşandîn, li kêla
tirbê, li wêneya qanatî naskirî
mêze dikir.**

**Min jî rondik
bi nihênî paş dikirin.
Vê carê bêdengiya peyt
zarê min bû.**

**Min nikarî wek caran guh
li şîret û waneyên apo bigirta
û nikarî bi mizgînan
dilê zana geş bikira,
Qelemê min şikestî bû,
Her çivikan
li ber bayê
fênîk,
Li ber tehna
tavê
û vê carê bi kurmancî
hozana abedîna jînê dixwendin.**



Institut kurde de Paris

**LI WIR
LÊVÊN KEVIRAN
ÇİK DIDIN**

*" Bi dama muhbetê bend im
xedenga fiqetê dîl nuht "*
M. Cizirî

*Nagihnimê ...
Lê meraqan ..
Çi lê bikim !
Ew gunehkar in, xedar in,
Kes nikare wan bendî ke,
Bi cuda gazên Jehrayî bikujîne,
Ew min bi wê hindavê de
kevir dîkin.*

*Ma we dîti
ço kevir ji hev hez dîkin?
- Li wir*

**gavê kevir hev maç dîkin,
Çik ji lêvên wan dibarin,
Di ber janên zayînê re
çavên êgir dîpişkuvin,
Ew afrandîyê agirîn
wêderî ye,
Bi navê hevmervatîyê
bang min dîke
û ez li dûr
di nav terrafê kelan de
dîşewitim.**

**Kî kare min bi wir gihne?
- Li wir,
Li herema
ku zornî Hemedokê ne
bes mirovan,
Lê belkî çiyân, gewerran
kovan dîke,
Şadî dîke,
Li wir,**

**Li cihê ku
tama firîk û xermanan
bi demsalan dî bin zimanî mera de
we dimîne.**

**Min bi wir gîhin
ta ez hulma axê piştî
dewatê kîsel bihn bikim,
Ta ez mizgîna çivîka
berfê
li ser keleman bibîhsim
û wek berê
nîvrût û pêlav kunbûyî
bi topaçan
li gel zarrokan bilizim.**

Institut kurde de Paris

**Min bi wir gîhn
da bibîhnim
çawa tîrên royê, siyê
têve didîn,
Pîxwîrê jî kokên darên
tizbyê jî xewê radikin
û taştayî
sibexweşyê li gundiyan
belav dîkin.**

**Min bi wir gîhn,
Mila jî bo çend saetan bê
bo ez fatînekê li ser
tîrbên dêbavê bixwînim,
Ez têvel gulên çiyayî
li ser gornên wan biçînim,
Bi sîrîşkan wana avdîm.**

Min bi wir gîhn

da ku
ez kenên dayê bibîsim,
Gava ew bi zarroyên xwe
we şa dibû,

Min bi wir gîhn
da ku
ez giriyên wê hemêz kim,
Gava bavê min lê dixist;
Agir û alaf bi kezebên me dixist,

Min bi wir gîhn
da ku
ez neviyên
dayê û bavê bibîhnim,
Pê şa bibim.

Erê, rojgar!
Nizanim tu heyî ya na?
Çawa mirov ji kevnar de

**lava li te dîke, ez jî
lava dikim:
Em pûç dibin li dûrbûnê;
* Ez çi bikim, mêrê bikeve welatê
xerîbîyê
qîmet jî mêr re naminin li xerîbîyê*1)
De mila dilê te jî rojekê bi me
bişewite,
Bervê xwe bi aliyê me de
bade,
Me li welêt,
Li bêtirsîyê,
Li landika zaroktiyê
vegerrîne.**

***1) Di êvara yekitiya nîskarên elman de
(4.12.92) li Bonnê, li Rheinisches
Museum bi kurdi û bi elmani hat xwendin.**

1) Ji folklorê kurdi.

MIN EW DÎT

**Xewn bû, rast bû,
nizanîm çî bû .. !!
Lê min
ew dî nav rengên biharê
de dît.**

**Pîr şabû bûm,
çepke gulên jronahiyê
min pêça bû
û bi hevdên porê spî
girêda bû
û bervê çûm.**

Institut kurde de Paris

EV DILA !!
(Bi awayekî folklorî)

Dilo!
Xem û keser jêbarîyo!
Ji xêlî dem de zamdaro!
Li nav berfê hêwirrîyo!
Li ser zinar û kendalan
rêçhêştiyo!
Bi her çekan teqîbwîyo!.

Dilo!
Di zîndanên de rizyayo!
Di bergiryê de yektayo!
Ji mêranyê mêrantiro!
Tu jdil, dilê
vê cîhana
xapînok î.

Mezino! Dilo!
Tu dilê min î..

ÇÎVÎKA DILBANÎ

***Tu çivîka dilbanî yî,
li ser şiqinên vî dilî
hildipekî û dixwînî;***

***ji eşqan re
bejnê dinê
dilerzînî.***

Institut kurde de Paris

EW

***Ew ronahîyê
dikujin daku
vê cîhanê bi
hovîtyên xwe
tarî bihêlin.***

Institut kurde de Paris

HERTIM JI TE RE

***Eger dûrî
zaroyek ba,
min ê nikarîba li wî
sêr bikira;
çavdamirtî
ezê di ber
firoşgehên listikan re
derbasbama.***

***Eger tu jî
bi dûrî bî,
li her cîkî
ezê piştî xwe bi tehta
meraqaqan dim
û jî te re
hertim
bilorînim, binenînim.***

PEYVÊN ME

*Peyvên me
wek heyîna me
sêwî selekî ne.*

*Ew jî lihev nakin,
serhişk in, bîhteng in,
wek xurmîna ewran
tîndar in.*

*Peyvên me
şîrîn in,
hingiv li hember wan
şermîn dibe,
ew mîna çîya sert in,
nola nazliya kulîlkan nerm in.*

*Peyvên me
evînê û torinê
di hemêzên xwe de tîmar dikin.*

MÎVANÊ XWÎNGIRAN

*Ev darkuta
ji kuda hat ? ;
kokê serî min dikute,
mêjî min ditengijîne;
dî nav tewjimê erd û
esmên de min diguşişê
û lbadike.*

Institut kurde de Paris

GIRAV

Arxayînî
porê gustîlkî raketî,
şenebûyî, lihevketî
nikarim pêlikan bûhnim.

Nihêniyan
ez nikarim bilivînim
û ne li çavên wan sêrkim.

Li girava
destneketinê çavrêya
destneketinan ew dike.

XWÎN SAR BÛYE ..

*Daxwaz guf in,
li bin sîyê
janan
meyîmeng in;*

*melûl digrîn
bo reşgirêdana erdê;
xwîn sar bûye
di mêjî mirov de.*

Institut kurde de Paris

DI TEWANDINÊ
CIH Û DEMÊ DE

1.

*Ez bi çi zimanî çêlî
dengî te yî firîşteyî
bikim !!*

*Çinkê hemû
peyv ditirsîn
û dihezin
gavê dikevin coxînî
dengî narîn.*

2.

*Ma bi elfabeyeke nû
û bi zimanekî teze
ezê karibim maka
meseniyê
numa bikim !!*

3.

*Gavê dengî
te dibîhsim
cih û dem bêpîva dibin,
di nav hevdu de ditewin,
çerx bi xeniyê digere,*

*êş kûdibin,
diçelmisin,
di wê bîhna cadûyî de
hêviyên min nêzîk dibin
û dêya xwe dibînim.*

4.

*Evîndara
derya, çiya,
deşt û newala,
şar û gunda,
li rojava,
rojhilata
hestên nûber
bi tîşkên vîne avdidan.*

5.

*Ew wek te bû,
tu wek wê bû;
bi deng û reng,
li ber derî
em sekinîn,*

*hemû ziman
me jbîr kirin,
li wê derê
kulîk şîn bûn,
bû gulîstan.*

6.

*Evîdarên
evîndarî !
Li her deman
jwe hez dikim;
li demên
mirinê,
mayînê
jwe hez dikim.*

TOFAN

*Dema derbûna xwînê li me vegeî,
tofanên nû
piştî xaçkirina raman*

*û rizîna gewriyan hatin
Derwazên perjengan vebûn,
hestyên candar û necandaran dihêrin,
ew dilovaniya xwedê:
berhem, sûr û dirozên pîrozî didin
ber dabanê bêxwedîyê.*

*Kes nema ku
erdkeştiyê
ji pêlên xwînê rizgarke,
bi perava felatê de
bajo
û ne Cûdî serbest e ku*

*şiverêyên xwe dûz bike
bo lengeriyê.*

*Bazdanokên tîşkdar teng in,
limên kînan rê girtine.*

*Aqil bend in
û pendyarî
wê çî demê
xwe pêşande !!??*

Institut kurde de Paris

JI " BIRÎNA ÇÎYA "

helibestine bijarte

ژ « برینا چیا »

ههلبهستنه بژاره

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

XEMEK

" Birîna Çiya " sala 1978a li Düsseldorfê bi arikariya AKSSA belav bû. Çend libên wê li Mosko ghiştin destên min, gava min rûpelîne wê tevdan, hema di çih de min çend jê qetandin û rûpelîne din ji bi qêlem dirrandin; nimûnen we mişt ji çewtiyên çapanî min berî derketina wê ne dibûn û ezê ne bihnim..

Wê çapê ez ji " Çiyan " bêtir birindar kirim; carina kurd govdi hevdu diqelişinin, birinên kûr lê vedikin bêyi bir bikin ku ew bi sed salan ji sarrêj na bin..

Ew berevoka nûber - zarroyê yekem - bi mirdarî li min vegerrandin. Hemû hewldana min ew bû ku "Birîna Çiya " bi kurdî be, çinkê mirov nikare eşên birinan bi zimanên bêgane binizine; di diwartirin bihî de mirov bi zimanê dayikê bangî dayê dike..

Min dizanî kurmançiya min ya wê demê jar e, lê kam ew bû ku rûpelîne kurdî zêde bibin, min ji ber wê jariyê fedi ne dikir, min digot mila wek zarroktiya min niv rût be..

Pirraniya berhemên di vir de vebrajtine hevpişene min wegerrandine zimanên rûssi, ermenî û elmanî, ez wan li hevdişinên wêjeyî bi Yekitiya Nivîskarên Elman re dixwinim, hevî ew e ku bê lengî ez wan bi hevwehatiyên xwe gihnim.

14.12.1992

RO KUŞTIN

*Gavê royê
dikujîn, deva mefroşin,
Gavê royê
dikujîn, rabin, meskinin.*

*Ez peyda bûm,
min ji kesî guhbihs nekir
ku ro hatibû kuştin di
wê katê de,
Giryam, giryam,
Bo çi ro hatiye kuştin?*

*Gava ez û bihara dil
mijûl dibûn bi ramûsan,
Ji nişkava
birûskek hat,
Ihêvya min xist,
Xwîn herrikand,*

پرو کوشتن

گافن پروفین
دکورت، دهقا مه فروشن،
گافن پروفین
دکورت، پابن، مه سکن.

نه ز به د بوم،
من ل که سی گو هیس نه کم
کو پرو هابو و کوشتن د
وی کافن دا،
گریام، گریام،
بو ه پرو هاسیه کوشتن؟

گافا نه ز و بهارا دل
مروول دیوون ب پاموسان،
نشکافا
بروسکی هات،
لهتعبیا من خست،
خوین هه رکاند،

**Aso sor kir,
Lê xelkê erd û ezmanan
nizani bû
ku bayê xwini dikşandin.
Ez vegerrim li perçeyan,
Min dan ser hev,
Min gazî kir
li Xwedayê
mezin,
Ew vegerrya li min bi ken.**

**Min Gul veşart,
Min jê re çêkir mezelek
ji hêstiran,
Min kir qêrî,
Bi qêrîna min re hatin
gur û cinewarên çolan:
Megirî, megirî,
Evîndarê tirba tez e,
Rabe, em bi hev re herrin
welatê me,**

ئاسۆ سۆز کر ،
لی خه لێ نه رد و نه سمانان
نزیاسیوو
کو یان خوینتی دکشاندن .
نه ز نه که پیم ن به چه یان ،
من دان سه ره هه ئ ،
من گازی کر ل فوه دای
مه زنی ،
نه و نه که پیا ل من ب که ن .

من گول فه شایه ،
من ئی یا جلیگر مه زه له ک
نر صیستران ،

من کر قیری ،
ب قیریئا من یا هاتن
گور و جنبه و این چولان ؛
مه گری ، مه گری ،
نه قیناری تریا نه زه ،
یا به ، نه ب فهو را هه پین
وه لوق نه ،

Hene li cem me keçên cwan,
Roya bedew,
Werzê vinê.

Bazdan cinewarên çolan,
Gava dîtin,
Porrê min sipî hilgerrya,
Gava dîtin,
Rengê min reş pengirrya.

هه‌نه له جهم مه که‌چێن جوان ،
په‌ڕه‌یه‌ ده‌ ویا وه‌ زه‌ڕه‌ نه‌ مین .

مازوان هه‌نه‌ وایێن چو‌لۆن ،
گه‌ڵا‌ دیتین ،
په‌ڕه‌ زه‌ڕه‌ سپی هه‌لگه‌ په‌ریا ،
گه‌ڵا‌ دیتین ،
په‌ه‌نگه‌ من په‌ه‌نگه‌ په‌ریا .



DI DESTPÊKÊ DE EVÎN BÛ

Ronyê çavan
ezê jî te re bidoşim,
Dî biroşê diwaroj de,
Ezê jî te re biharek
serketinê bimeyînim
û perspan kim
hemû werzan
bi rengê evînê.

د دهستپهکی دا
ئه قهین بوو

ئوینی چاوان
ئه زهه به ابدوشم
د بروشی دواروژ دا،
ئه زهه به بهاره ک
سه که نهی به بهینم ان
و به بهینان لم ره وووه زن
به به نهی به بهین .

DI TALDÊ MEMKÊN TE DE

*Stêrkên esmanê bilind,
Ezê bihnim
û ji te re bi guhar kîm,
Ezê ji te re çêbikim
gerdenikî
ji bihna gulên evînê
û li ser sîngê te ezê
vekim
welatekî nû, bê wêne,
Ê bi mîvandari werin
welatê me
Mem û Zîn, Ferhad û Şîrîn,
Emê sînorên xwe vekin,
Ji feqîrên cîhanê re,
Bê passepport ê derbas bin
û di taldê memekên te de
evîndarê bikî seyran.*

DÎWAR DIGIRÎ

*Min namak kir
berîkî pepûlekê û
şandj te re,
Lê bigûman bûm
ku ew bi te
gîhne,
Çînkê di vê demê nesax
û rezîl de
ta ji pepûlan paseportan dixwazîn
û eger qedexesînor
bê rêdana wan birrî be,
Wê tazî kin,
Û lê xînin,
Gavê navnîşanê min li
ser namê bê
Û bibil şahîd bû li ser
gotînen min,
Gava li ber derî saz kir
û maf kir girîna dîwêr.*

BIRÎNA ÇÎYA

*Serî memkê
gotinê te
ez maç dikim,
Şîrî hêvyê
te dimijim,
Bi wî şîrî
mezin dibim,
Heya keçên mina te ez
jê hez dikim.*

*Evîndarê!
Ez dixwazim
çîrokekê bo te bêjim:
Jinek hebû,
çarde mehan avis mabû,
Di meha panzda de zarrokekî bêçav
anî,*

**Nexwastin jîyan jî wî re,
Tol kirin li ser stîryan,
Bî birînên wî, xwîna wî
gelek şa bûn
Û hîn dibên:
Xortek hebû
li nav çîyan,
Evîndar bû,
Gelek salan
li benda dergistya xwe bû,
Bî navî wê
kulîk zanîn,
Bî navî wê
stêrk zanîn,
Jî bo wê çav
ne didan hev,
Hevdîtina Leylê û Mecnûnê dîpa.**

Institut Kurde de Paris

**Li biharan
ew bi eşq bû,
Li havînan
xwînrengîn bû,
Li payîzan
ew baran bû,
Zivîsatan
qehreman bû.**

**li dewatê,
Li dîtîné,
Mêr bi Biharê yada .. Kuşt...**

**Evîndarê!
Û hîn dibên:
Her şivîlak
kurdîstanî
evsanek e
Û ji bo wê**

**Bi min xweş ten:
peyvên çîyan,
Şayên çîyan,
Bayên çîyan,
Brinên çîyan.**

DI NEWALÊ ...

*Di newalê dilî min de
rabû firtenek meraqan,
herrikî, dan ber xwe hemû
nalên, derdên
salên kevnar,
Şuştin ew rengên qermicî,
Dî wê rojê de ro derket
ji rojava,
Ez û bi tu ve
man bi hev re.*

Institut Kurde de Paris

LI BAJARÊ MEZIN

***Ez li bajarê mezin im,
nimêj dikim
bo rojên avîs bi hêvîyan,
Bona peyvên
hîn ne bûne,
Dermeketine jî devî
bextewaryê fetisandî.***

Institut kurde de Paris

GER TU KURD BÎ

**Ger tu kurd bî,
Tê nişan bî,
Bo qurşinan,
Bo naxweşyan.**

**Ger tu kurd
Tê bê maf bî,
Tê birçî bî,
Tê tazî bî.**

**Ger tu kurd bî
û bibêjî:
Çar hindav li dinê hene,
Ê bibêjin: Tu şaş î her
ne rast e.**

**Ger tu kurd bî,
Tê pîr caran bê heval bî,**

**Tê di hepsan de birrîzî,
Û kes ê li te ne pîrse.**

Kurdo! Kurdo!

**Çiqas firtenên derdan li te bar kirin!
Çiqas êş jî te re çandin!
Çiqas kanyên sor li govdi te vekirin!
Çiqas xwastin te di şevreşyê de bêlin!**

" Û bi bêjîngan tirên royê nê nê girtin "
Çawa ku ava okyana xelas nabe,
Xwîna te jî xelas nabe,
Çawa çîya bê ba nabin,
Tu jî bê mêranî nabî,
Çawa esman jî stêrkan bê par nabe,
Tu jî bê maf nabî,
Çawa cîhan bê ro nabe,
Tu jî bê serbestî nabî.

NÊZÎK ME BIN

*Ez gurî me,
Çinkê bi serbestya kurdan
ez bang dikim.
Ez nexweş im,
Çinkê kurd im,
Serbilind im.*

*Nêzik me bin,
Ber min me tîn,
Ez hişyarvanê derda me,
Ez bêbextan dikulinim,
Ez dijminan riswa dikim,*

*Nêzik me bin,
Ji zarrokan ez hez dikim,
Bi dengî wan serxoş dibim,
Li lîskê wan hazir dibim.*

**Nêzîk me bin,
Helbestvan im,
Bî helbestên
xwe ez çûkan dikim xewê,
Exresan bî ziman dikim,
Mirovên kûr bî çav dikim,
Bî helbestên
xwe ez cejnên dibarînim.**

Institut kurde de Paris



JI SORETÊ ÊŞAN

*Dijwar e ku ez bêkes im,
Ez şev û roj dînalim
ji dîtinên laşên mirdar,
Tazî me ez,
Birçî me ez,
Ez im, ewa
ku çar kêl li bejnê fodil
hatin venan.*

Institut kurde de Paris

HER STÊRKEK ...

*Her stêrkek
tê rjandin,
Ez jî vê re
têm rjandin,
Gri dibin yek,
Saz dibin yek..*

*Ez dîkebvîm nav damarên
daran,
Tê de dîjim,
Gelek salan,
Mezîn dibim,
Biçûk dibim...*

*Dî nav govdi
berbangê de
ez dîminim,*

*Bijangên royê ez dişûm,
Ewran
têvedidim, rê dûz dikim..*

*Dibim sih ji westîyan re,
Dibim hevîj dûrvanan re,
Dikevim nav dengî avê,
Erdê pît û telbîz dikim,
Deman
hişyar dikim,
Dilî séwyan azad dikim,
Ji keseran,
Ji nalînan.*

Institut kurde de Paris

KUTÊBA MIRINÊ



Institut kurde de Paris

Orfîyos!

**Can dî pîkî te de heye?
Pêde, çavên te maç dikim,
Pêde, pêde,
Ez bî qurban.**

**Li nav qonaqên tuxturan,
qesabxanan,
Li ser lîngan
em dibhurtin,
Peyvên tuxturan zihêr bûn,
Bihna mirîné, nemané
Jê kel dida.**

**Remildaran,
Şêxan, melan,
Nîrîn, xwendin,
Nîvisandin ..**

" Çi gotin iro tuxturan"?

Ew dipirrese.

- Stêrka me stî liyan xist,
Bawerîyan ber avêtin,
Bihar îsal ser jê kirin.

" Ger, ew werê, ezê çê bim"

- Li ser baskên derdan ew hat,
Bi dîtina te, bê deng bû,
Zimanê wî bes hêstir bû,
Jwê rojê de
bi zimanekî nû fêr bû.

" Tuxturan gotin ez çênabim, namînim,
Bibê yawrim,
Te tu caran
vîrr li anê ne kirine ".

Dûmanekî

reş tim li ber

çavên min bû,

Çavên min ketin, bê birû,

bê bijang mam,

Lê min tu caran rêya dermankirîne
şaş nedikir
Û pê dihesim ço xelkê
rûyê xwe Ji
dîmena min digewrandin.

Mid hemêzê xwe ke, anê,
Derdî xwe bi min de, anê,
Me bi tenê mehêl, anê,
Bila şadî ne bin, anê,
Min bi xwe re bibe, anê.

Merre, anê,
Em biçûk in,
Em bê bext in,
Neyar pîrr in,
Bê dê zor e.

" Megrî, bo çi tu digirî?
Ez namînim,
Ezê hîn li dewatên we

*bilîî kîm,
Bî zarrokên we şabîbîm,
Kêf û xweşyên we dibîhnîm.**

*Na, anê, na,
Dîtî nî kin ma,
Nema dijî,
Tuxtur dibên,
Nema dijî.*

*Na, anê, na,
Rê nêzik bû,
Lî saetan ma,
Lî deqan ma,
Na, anê, na.*

** Herre Şeyar 1) jmin re bîne,
Belkî maçîrîna wî dermanê min bê,
Belkî dîtîna wî min bî ser xwe bînê
Ger tuxturan zanîbana,
Ezê çêbibama, ezê
saxbibama,*

**Ew nizanin,
Na, nizanin."**

**Wek dilopên
Ji xanyên fiqaran de têt,
Di zivistanê gergîn de,
We jî êşên gergîn dilop
bi nav govdi te de berrdan
û tu alêstin bi zimani mirinê.**

**Min zanî bû
ku heft rojan
te nan ne xwar,
Min zanî bû
di nav okyanî xeman de
tu btenê bû,
We jî êşan dewlemend bû.**

**Heger te zaniba min ço
piştê werzan
birin kirî
bi hêstiran,
Tê bihata,
Anê,**

Institut kurde de Paris



Heger te zanîba, gavê
jînên mîna te dibîhnim
li dûrbûnê
û ez
dest û lingên wan maç dikim,
Tê bihata,
Anê.

ê
Hegr te zanîba ço ez
li şahya guf dibim, gavê
tostan 2) ji bo
dêkan dibên,
Tê bihata,
Anê.

Ax.. Ax..
Te zanîba.. Te zanîba..

* Li dor min bin,

**Dûr me kevin,
Şeyar were,
Ma kî yê serî te bişû?
Ber destî kê tê bîminî?**

**Du peyvên paşin derketin
Ji şiketa qêrinê,
Ji girîngê derketin,
Du hêstiran
ez
verrêkirim
û bes ew bûn,
Em cuda çûn.**


**Bibûre anê, çetin bû
ez
te verrêkim,
Di bin salecê te kevim,
We çetin bû ez te çal kîm,
Çetin bû.. Pîrr..
Pîrr.. Çetin bû..**



Nenî.. Nenî..
Anê.. Nenî..
Dî xwastekên min de, nenî..
Dî nav kenî min de, nenî..
Dî nefesê min de, nenî..
Dî mindaltiyê zarrokên min,
Yên hin li rê,
Nenî.. Nenî..
Dî cwantiyê min de, nenî..

Heger dîm bûm
û ez tazî, birçî gerrim
û şev û rojan min serî
xwe min danî ser tîrba dê,
Loma me kin..
Ji bo dêkan.

Heger ez bûm
kanî, gelî
ji hêstiran
û gavê wan



**bi lêmiştan
kêfên we dan
ber xwe,
Loma me kin..**

**Heger tîpên min, peyvên min
kûr bûn û rêç hinda kirin
û helbestên min dewrûber
zihêr kirin,
Loma me kin..
Rîca dikim..**

**Anê.. Anê..
Bo çi weqas tu blez çuî?
Şeyar serî xwe dîdine
ser singî min
û di ber xewê re dibê:
" Ma an kuda çû, xêr natê,
Ma an çû esmanan wek Dedê? "
û bi roj jî
tîm dipirre**

**Û gavê hêstiran dibîne, dipirse:
Ji bo çi tu dîdêgirî
Ma an natê? "**

**Anê.. Anê..
Ji bo çi te hêşt ku Şeyar
zû bizane..
Ji bo çi hêstir çêbûne..**

**Nenî.. Nenî..
Anê.. Nenî..
Lî ser balgyê
zaroktiyê Şeyar, nenî..
Di birê peximberan de,
Mîndalan de,
Di birê helbestvanan de
nenî.. Nenî..**

**Benderê dilê şikestî
bû welatek ji sêwyan re,
Wêneya dê ala wan bû..**

**Bi hemû jinên dinyê re
dibêim: Anê;
Dêka min reş e, spî ye,
Zer e, sor e,
Lê bi sistî
tîm bi min re
dibêim: " Yawrim "**
Ax.. Ax.. Anê..
Heger carik
tenê, bes carik tenê te
bi min re bigota " Yawrim "
Besê min bû..
Anê.. Anê..
Besê min bû..

- 1- biçûktirîn birayê helbestvan e,
wê demê ew şeş salî bû.
- 2- Peyveke rûsî ye bi mana nûşin tê.

DI NAV BASKÊN ..

*" Em çi karin yarmetîyê
ji te re bikin."*

Lîda

*Di nav baskê
peyvên te de
min konek ji bizan vegirt,
Di nav ewrî
hêvyên te de,
Tavek meraqan min barand,
Li ser zozanê dengî te
ez hêsa bûm,
Min êxistin
kincên derdan.
Îro gotin
rengê gul in,
Min diparêzin ji êşan.*

*Peyvên bedew,
Peyamên mizgînan dan min;
Îro min şayî belav kir
li zîqaqên,
Li çarşîyên
Êrêvanê.*

LI BENDÊ WE ME


**Bi mindaltî
ez karvan bûm,
Min karên xwe diçêrandin
li gewerran,
Li newalan.**

**Ez zarrok bûm,
Çiçê sermê min dîmêtin,
Firtene hevalên min bûn,
Hazir dibûm
li dewatê pêplûskan,
Nêgiz bi min re dikenîn.**

**Ez zarrok bûm,
Di hemêzê Fidanê de,
Li ber dengê wê diketim**

xewa şîrîn,
Qîr-qîrra dîkan xewnên min
dîrrevan dîn.

Ey zarroktîya bextewar!
Were, anê bî xwe re bîne,
Sêwî mam, li bendê we me.



NAVEROK

<i>Şehîd pîrr in</i>	6
<i>Şehîdan jibîr mekin</i>	7
<i>Ewê rojekê kuştî vegerrin</i>	8
<i>Şerma mezin</i>	12
<i>Deng</i>	13
<i>Bi hindava tîrêjan de</i>	14
<i>Gêlas</i>	16
<i>Kurdistan</i>	23
<i>Vî pesarî</i>	24
<i>Zarroyên me dikujin</i>	30
<i>Dilî xwe bi têt ke</i>	32
<i>Ewên raketine</i>	36
<i>Heyîna tal</i>	43
<i>Ozon birîndar e</i>	44
<i>Vê Newrozê</i>	46
<i>De mila carekê jî we ba</i>	48
<i>Ji Kirîstyanê re</i>	49
<i>Ji gotinên jineke kurde</i>	
<i>penaber</i>	50
<i>Ev pêrryana jî dûr ve têt</i>	52
<i>Bêje ..</i>	56
<i>Tu</i>	57
<i>Harbûne</i>	58
<i>Li ser rêçên kevin</i>	59
<i>Rêkord</i>	60
<i>إن العرب ينسردون في البرائح</i>	61
<i>Kes nikarê</i>	62
<i>Hogir bû</i>	64
<i>Apo! Em hatin</i>	66

<i>Li wir lèvên keviran</i>	
<i>çîk didin</i>	69
<i>Min ew dît</i>	77
<i>Ev dila!!</i>	78
<i>Çivîka dilbanî</i>	79
<i>Ew</i>	80
<i>Her tim ji te re</i>	81
<i>Peyvên me</i>	82
<i>Mîvanê xwîngiran</i>	83
<i>Girav</i>	84
<i>Xwîn sar bûye</i>	85
<i>Di tewandinê cih û demê de</i>	86
<i>Tofan</i>	89
<i>ji "Birîna Çîya"</i>	91
<i>Xemek</i>	93
<i>Ro kuştin</i>	95
<i>Di destpêkê de evîn bû</i>	100
<i>Di taldê memkê te de</i>	101
<i>Dîwar digirî</i>	102
<i>Birîna çîya</i>	103
<i>Di newalê ..</i>	106
<i>Li bajarê mezin</i>	107
<i>Ger tu kurd bî</i>	108
<i>Nêzîk mebin</i>	110
<i>ji soretê êşan</i>	112
<i>Her stêrkek</i>	113
<i>Kutêba mirinê</i>	115
<i>Di nav baskên ..</i>	130
<i>Li bendê we me</i>	131

Hussên Hebeş

Sala 1948a li gundê Çeqmaqê Biçûk bûye.
Xwendinên destpêkî, navîn û bilind li Reco,
Efrîn û Helebê tamam kirin.
1972 diçe Yekîtiya Sovyête bo xwendina zanîngehî.
Li fakûltêta Rojnamevaniyê pênc salan dixwîne
û magîstir di sala 1978a werdigire.
Di salên 1979 - 1982 lêgerrîna doktora tamam dike
û tîtila doktorê zanistiyên fîlologî (Ph.D) werdigire.
Ji sala 1984a li Elmaniya Fêderal dijî.

BERHEMÊN BELAVKIRÎ:

- Birîna Çiya Helebest 1978
- Strana êşan û hêviyan 1977 (Fîlmekî belgehî ye)
- Sê rojan li KEF 1978 "
- Rola Hawarê di pêşxistinê kûltûrê kurdî de 1982
- Lêrmontov Helbestên bijarte 1985
- Çend stranên folklorî 1987

Berhemên amadekirî hîn çavrêya belavkirinê dikin.

SPASÎ

Eger ne ji arîkariya rêzdar kak Fuad Eqrawî ba, ev berhema niha ê belav ne bûya; ew ji zû de amadeye bona çapê, lê pirs-girêka diravî rojên bûyîna wê biderengî dixist.

Ez spasî xêrxwazê geşkirina peyva kurdî, brayê xwe Fuad dikim ku lêçûna çapê da ser milên xwe û ev kara di bihara 1994 de gihand xwendevanan.

Giring e hîn rastîyek jî bê çespandin: Divê em kurd berî her tiştî li comerdî û mêrantîyên hevdu vegerin; ew yeka ê me bi pêşxîne û seriyê me bilind bike. Stixwerkirin li pêş bêganan, parî û gepên dervayî pir caran rij in, jehrdar in .. Ew me têr nakin û rûyên me şengîn nakin.

Serfirazî ji hemûyan re yên bi her awayekî li peyva kurdî xwedî derdikevin.

*Peyvên me/ şîrîn in/ hingiv li hember wan/
şermok dibe/ ew mîna çîya sert in/
nola nazliya kulîlikan nerm in.*

H.H.

THERE, THE LIPS OF THE

STONES EMIT A SPARK

Kurdish poems

by

Hussein Habash

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris